Ji Penûsê Jinê Rastîya Jîyanê

RAPERÎN

Dîrok: Tîrmeh 2026 Hejmar:19 Biha: 2000



DESKEFTIYÊN JINAN HÊZA ME NE

EM Ê BIPARÊZIN



ROJEV 2 — Di Krîza Hegemonyaya Kapîtalîst Da Parastina Şoreşa Jinê ya Rojava

DOSYE 4 — Hêsirên Dayikên Dîlgirtî Guleyên Me Ne

JIN Û JÎYAN 5 — Berxwedana Jinan a Ku Dîwaran Kela Zindanan Hilweşîne

Di Krîza Hegemonyaya Kapîtalîst Da Parastina Şoreşa Jinê ya Rojava

DYA'ya emperyalîst, ji bo ku hêza xwe ya paşveçûyî ya li ser asta gerdûnî ji nû ve bi dest bixe, dest bi hemleyeke nû ya stratejîk kiriye. Armanca vê hemleyê ew e ku hegemonyaya xwe ya aborî û siyasî qayîm bike. Di navenda vê stratejiya nû de qelskirina Çînê heye; ji ber ku DYA, Çînê wekî hevrika xwe ya sereke ya aborî û gerdûnî dibîne. Ji bo vê armancê jî, yek li pey yekê gavên leşkerî, siyasî û aborî tên avêtin.

Vê têkoşîna hegemonyayê li gora berjewendiyên kapîtalîzmê şêwaz girtiye. Ev şer li ser xwîn û mêtingeriya jin û gelên bindest tê meşandin. Piştî şerê Ukraynayê û Rusyayê ku hevalbenda Çînê ye û paşvekişandina Rûsyayê ya li qada Sûriyeyê, niha jî dor hatiye dorpêçkirina Îranê û jiholêrakirina hêzên çekdar ên ku bi berxwedanê re ne.

Siyaseta Rojhilata Navîn û Planên Emperyalîst

DYA'ya emperyalîst ji aliyekî ve baregehên xwe yên leşkerî yên li Rojhilata Navîn xurt dike. Ji aliyê dema din ve jî, ji bo ku hegemonyaya xwe ya siyasî û aborî ya li herêmê mayînde bike, piştgiriyeke rasterast û bêsînor dide dewleta Îsraîlê ya siyonîst. Ev piştgirî hem di qirkirina Xezeyê de hem jî di êrîşên dagirkeriyê yên li ser xaka Sûriye û Libnanê de xwe nîşan dide.

Bi şerên herêmî, dorpêçkirin, gefên dagirkeriyê, ambargoyên aborî û bacên nû yên gumrikê, pergaleke nû ya emperyalîst li ser hemû welatên herêmê tê ferzkirin. Di vê pergala nû de, para jinan tenê destavêtin, mirin, birçîbûn, firotina li bazaran, revandin, êşkence û girtîgeh e.

Di vê pêvajoya bixwîn de, eniya bindestan derbên giran xwarine. Berxwedana Fîlîstîniyan a ku bi salan e didome, bi êrîşên qirkirinê yên li ser Xezeyê tê xwestin ku were qelskirin. Di heman demê de, navendên berxwedanê yên li Libnan, Sûriye û Yemenê bûne armanca rasterast a eniya emperyalîst-siyonîst. Siyasetên tepeserkirin û tunekirinê li her deverê Kurdistanê têne meşandin. Rejîma mollayên Îranê bi nefreteke bêdawî êrîşî Kurdan û şoreşgerên jin dike. Li Iraqê, pêvajoya entegrekirina hêzên Pêşmerge û Heşdî Şabî di nav artêşa Iraqê de didom e. Li Sûriyeyê, çeteyên tecawizkar ên cîhadîst di bin navê "Dewleta Erebî ya Sûriyeyê" de nasnameya Kurd înkar dikin. Zîhniyeta dewleta metingehkar li her deverê Kurdistanê êrîşî gelê Kurd, şoreşgeran û bi taybetî jinên pêşverû dike.

Gefên HTŞê Cîhadîst û Dewleta Tirk a mêtîngehkar ya dijmintiya Şoreşa Rojava

Piştî hilweşîna dîktatoriya BAAS'ê, valahiya desthilatdariyê ya ku mabû, di vê konjonktûrê de bi veguhestina çeteyên cîhadî yên HTŞ'ê ya ber bi Şamê ve hat dagirtin. Ev çete li Idlibê di bin parastina emperyalîstan û dewleta

Tirk a mêtîngehkar de mezin bibûn. Dewleta Tirk a mêtîngehkar parêzeriya van çeteyên dijminên jinan û paşverû dike û hewl dide wan li ser maseyên navneteweyî rewa bike.

HTŞ'ya di bin serokatiya Colanî de (ku niha girêstirkê lê dikin), piyonekî emperyalîzmê ye. Ew ji bo pelçiqandina dînamîkên şoreşger ên li herêmê, ji bo perçekirina piştgiriya enternasyonalîst a di navbera gelan de û ji nû ve avakirina serweriya mêran hatiye sêwirandin. Ev paşverûtiya cîhadî, ji bo gelên Rojava û bi taybetî ji bo jinên azadbûyî gefeke tunekirinê ya îdeolojîk, çandî û fîzîkî ye. Ev çeteyên di bin kontrola mêtingeriya Tirk de, êrîşeke berfireh a dij-şoreşê dimeşînin. Ev êrîş rasterast pergala civakî ya Rojava ya ku demokratîk e, gelparêz e, li ser wekheviya netewe û baweriyên cuda ava bûye û berî her tiştî xeta azadiya jinê dike armanc.

Plana Tasfiyekirinê ya li Ser Şoreşa Rojava

Xeleka herî krîtîk a vê pêvajoyê, plana tunekirina şoreşa Rojava ya gelparêz, demokratîk û azadîxwaza jinê ye. Îro Rojava ji aliyekî ve bi gefa dagirkeriya fîzîkî ya çeteyên cîhadî re rû bi rû ye. Ji aliyê din ve jî bi ferzkirina "entegrasyona siyasî" re rû bi rû ye ku armanca wê helandina Rêveberiya Xweser û tevlîkirina wê ya di nav avahiya dewleta burjuva ya li Şamê de ye. Ev her du dînamîk, du rûyên cuda yên heman konsepta tasfiyekirinê ne ku armanca wan bêçekkirin û di encamê de tunekirina hêzên şoreşger e.

Wekî ku em dizanin, entegrasyon ne tenê yekbûneke ji rêzê ye; ew radestbûna li ber çerxa mêtingeriya amûra dewleta burjuva ye. Modela entegrasyonê ya ku rejîma Şamê ferz dike, bi awayekî fîlî betalkirina Hevpeymana Civakî ya Rojava, pergala wê ya hiqûqî ya resen û xweseriya wê ya siyasî ye. Plana radestkirina çavkaniyên aborî ji bo rêveberiya navendî û veguherandina saziyan bo midûriyetên burokratîk, tê wateya tunekirina demokrasiya gelan.

Şerê Zayendî û Parastina Şoreşa Jinê

Ya herî krîtîk, ev pêvajo rasterast xwedî taybetmendiya şerekî zayendî ye. Nenaskirina qanûnên jinan, qebûlnnekirina YPJ'ê (Yekineyên Parastina Jin) ku hêza xweparastinê ya şoreşê ye, tunekirina pergala hevserokatiyê, kotayê, saziyên wekhev û saziyên xweser ên jinan û dadgehên edaleta jinan, derba herî giran e ku li şoreşa jinê tê xistin. Ev rewş tê wateya girtina jinan di malan de, anîna pirzewaciyê, û qedandina hebûna jinan di qadên kar û leşkerî de.

Bi şoreşa Rojava re jinan di hilberîn, siyaset û hemû qadên jiyana civakî de cih girtin, akademî û komunên xwe ava kirin. Lê niha, vegerandina wan a malê û koletiya keda navmalê ya bêewle û nexuya di bin ferzkirina jiyana baviksalarî de li wan tê ferzkirin. Gava ku rêxistinbûna leşkerî û saziyî ya serbixwe were tasfiyekirin, tu garantiya fîzîkî namîne ku paşeroja jinê û gelên bindest biparêze.

Destkeftiyên Jinan Hêza Me Ne, Em Ê Biparêzin

Em salvegera 15emîn a şoreşa Rojava bi kampanyaya "Destkeftiyên jinan hêza me ne, em ê biparêzin" pîroz dikin. Îro erka pêşîn a me Jinên Komûnîst ên Şoreşger û her kesê ku ji xwe re dibêje şoreşger, pêşverû û sosyalîst ew e ku li dijî van meylên lihevhatî û tasfiyekar, têkoşîna îdeolojîk di nav girseyan de bilind bikin. Dîrokê ne maseyên dîplomasiyê, lê girseyên rêxistinbûyî dinivîsînin. Tenê dermanê li dijî vê jehrê tasfiyekirinê ew e ;zelaliya îdeolojîk, xeta berxwedanê ya li ser bingeha çînî û azadîxwaziya zayendî ye. Werin em vê şoreşê, ku me bi bedelên mezin bi dest xist û bi destên xwe afirand, ji bo kesên ku dixwazin wê tasfiye bikin nehêlin

Li dijî polîtîkayên serdestan ên "parçe bike û bivebêşîne"; eniya têkoşîna hevpar a ku karker, kedkar û jinên ji hemû netewe û baweriyên bindest mîna Kurd, Ereb û Suryanî dê mil bi mil ava bikin, yekane hêz e ku dê barîkata dij-şoreşê hilweşîne. Vebijêrkên me zelal in: An dê radestî qanûnîbûna burjuva bibin û çavên xwe li tasfiyeyeke gav bi gav bigirin, an jî dê bi çalakiya mîlîtanî ya girseyan û hişmendiya xweparastinê, seferberiyeke bi heybet a şoreşgerî bidin destpêkirin. Paşeroja Rojava dê li kolanan, li çeperan û di rexistinen di bin pêşengiya jinan de were diyarkirin.

Jinên Sûrî: Di Navbera Dehsalên Têkoşînê û Zehmetiyên Daxuyaniya Destûrî ya Nû da

Meseleya jinên Sûrî qet ne li aliyekî maye, berevajî vê yekê, ew bûye beşeke yekgirtî ya têkoşîna ji bo azadî, edalet û wekheviyê. Tevî sînorkirinên civakî û qanûnî yên ku bi dehsalan rû bi rû mane, jinên Sûrî karîbûn hebûna xwe di warên perwerde, kar, çand û siyasetê de îspat bikin; her wiha kapasîteya xwe ya hilgirtina berpirsiyariyê û beşdarbûna di avakirina civakê de nîşan bidin. Di bin destûrên berê yên Sûriyeyê de, hinek bend hebûn ku wekheviya di navbera welatiyan de û mafê jinan ê perwerde, kar û beşdarbûna di jiyana giştî de dihesibandin.

Lêbelê, di pratîkê de gelek caran rastî tiştên cuda hatin. Ji ber ku jin ji ber cûrbecûr cûdakariyên qanûnî û civakî, bi taybetî di mijarên rewşa kesane, temsîliyeta siyasî û biryardanê de, êş dikişandin. Tevî vê yekê jî, tevgera jinan (femînîst) a Sûriyeyê berdewam daxwaza berfirehkirina mafên jinan û xurtkirina hebûna wan wekî hevkarên rastîn di civakê de dikir.

Bi destpêkirina şoreşa Rojava û guhertinên siyasî, leşkerî û civakî yên piştî wê, rola jinan li Rojava û Bakur Rojhilata Surî bi awayekî berbiçav guherî. Jin êdî ne tenê wergirên biryaran bûn an jî tenê ji bûyeran bandor dibûn, lê di gelek aliyên jiyanê de bûn beşdarên çalak.

Bi taybetî li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, tecrûbeya jinan ber bi qonaxeke din ve çû. Ew bûn şirîkên rêveberî û biryardanê, li ser bingeha prensîba wekheviya zayendî beşdarî avakirina saziyên sivîl, siyasî û civakî bûn. Yekîneyên Parastina Jinan (YPJ) di rûbirûbûna bi DAIŞê re û parastina civakên herêmî de roleke girîng lîstin; bi hezaran jinan di parastina azadî, rûmet û wekheviyê de qurbaniyên mezin dan. Ji bo gelek jinan, tecrûbeya YPJê ne tenê tecrûbeyeke leşkerî bû, belê bi ramana rizgariya jinan û parastina jiyana xwe, mafên xwe û cihê xwe yê di civakê de ve girêdayî bû.

Tevî van guhertin û qurbaniyan, daxuyaniya nû ya destûrî gelek pirs li ser pêşeroja mafên jinan li Sûriyeyê û Rojava derxistine holê. Xala 21emîn a daxuyaniyê parastina rewşa civakî ya jinan, parastina rûmet û rola wan a di nav malbat û civakê de, garantîkirina mafên wan ên civakî, aborî û siyasî, û her wiha parastina wan a ji tundûtûjî û neheqiyê destnîşan dike. Lê belê, li gorî gelek rexnegiran, ev gotin ji bo wan feda kariyên ku jinên Sûriyeyê di salên borî de kirine, kêm in.

Di heman demê de, zewaca di temenê piçûk de wekî tişteke normal û rehet dibînin; an jî ji bo kesên ku zewaca piralî dikin (kesên ku du jinan tînin) pereyekî zêde tê dayîn. Ev tişt di bingeha xwe de tê wê wateyê ku piştgiriya vê rewşê dikin. Erê rast e, van tiştan berî hikûmeta nû jî hebûn û ne mijareke weha bû ku ser bête sekinandin yan jî bête qedexekirin; zewaca di temenê piçûk de hebû, zewaca duyem û xwarina mafê mîrasê yê jinê hebû. Lê niha jî tu guhertin nehatiye kirin, hîn bêhtir zêde bûne û bi awayekî fermî weke qanûnekê hatiye derxistin ku ji bo kesên du jinan tînin pere tê dayîn. Yanî bi rastî, weke ku vê tiştî wekî serkeftinekê bibînin û bi vî şeklî jî wan xelat dikin.

Îro, jin ne tenê daxwaza parastin an naskirina rola xwe ya civakî dikin, lê di heman demê de wekheviya tam û şirîkatiya rastîn di hemû saziyên dewletê de jî dixwazin. Lêbelê, di deklarasyona destûrî de bendên zelal ên ku temsîliyeta jinan di meqamên biryardanê de garantî dikin tune ne, û ew prensîba şirîkatiya wekhev a di navbera jin û mêran de di rêvebirina welêt de nas nake. Ji ber vê yekê, gelek çalakvan bawer dikin ku nîqaşên li ser mafên jinan gelemperî û nezelal mane, û garantiyên destûrî yên rastîn tune ne ku van mafan veguherînin rastiyeke berbiçav.

Ji vê perspektîfê ve, gelek kes hîs dikin ku daxuyaniya destûrî asta guhertina ku jinên Sûriyeyê di salên şoreş û pevçûnan de jiyan kiriye, bi têra xwe nîşan nade. Jinên ku beşdarî têkoşîna siyasî bûne, saziyan birêve birine û ji bo parastina civakên xwe şer kirine, li bendê ne ku bendên zelaltir mafê wan ê azadî, wekhevî û hevkariya tam piştrast bikin.

Pêşeroja Sûriyeyeke demokratîk bêyî beşdariya wekhev a jinan nayê avakirin. Jinên Sûriyeyê û jinên Rojava di salên borî de şiyana xwe ya rêberîkirin, biryardan û parastina civaka xwe îspat kirine. Her destûrek ku dixwaze dewleteke dadperwer ava bike, divê vê rastiyê qebûl bike û mafên jinan ne tenê bi daxuyaniyên giştî yên li ser parastin û rûmetê, lê di heman demê de bi bendên zelal ên ku wekheviya tevahî û hevkariya rastîn di hemî waran de piştrast dikin, garantî bike.

Mafên ku jinan ji bo wan şer kiriye û gelek ji wan bi canê xwe bedel daye, divê nebin mijara danûstandin an tawîzan. Divê ew bibin beşek girîng a her projeyek ji bo avakirina pêşeroja Sûriyeyê. Mirov nikare behsa pêşeroja Sûriyeyê bike bêyî ku behsa jinên Sûriyeyê bike. Jin ne tenê nîvê civakê ne, ew şirîkeke girîng in di avakirina wê, girtina biryarên wê û diyarkirina pêşeroja wê de. Azadî û mafên jinan ne tenê pirsgirêkên jinan in; ew pîvaneke rastîn a pêşketin û demokrasiya her civakê ne. Ji ber vê ê, her destûrek ku dixwaze dewleteke nûjen û dadperwer ava bike, divê li ser prensîbeke zelal û eşkere bête damezrandin: jin di hemî warên siyasî, civakî, aborî û çandî de şirîk in, û mafê wan ê tevahî heye ku bêyî cudahî yan jî dûrxistinê beşdar bibin û biryaran bidin.

Destûr bi awayekî eşkere behsa wekheviya tevahî ya di navbera jin û mêran de di hemû waran de nake, û garantiyên destûrî yên girêdayî ji bo temsîliyeta jinan di saziyên dewletê de an beşdarbûna wan a di biryargirtina siyasî de jî saz nake. Wekî din, ew nekarî mekanîzmayên zelal destnîşan bike da ku hevkariya rastîn a jinan di rêvebirina welat de misoger bike, û xwe bi daxuyaniyên giştî yên vekirî ku rê li ber şîroveyên cûrbecûr li gorî rewşa siyasî vedikin, sînor kir. Tenê behsa "parastina jinan" têrê nake. Jin ji parastinê bêtir hewceyî tiştên din in; ew hewceyî azadî, serxwebûn, biryardanê û beşdariya bi bandor a di şekildana siyaseta giştî de ne.

HÊSIRÊN DAYIKÊN DÎLGIRTÎ GULEYÊN ME NE

Îro şoreşa Rojava ji aliyê çeteyên hov ve tê hedefgirtin. Gelek leşkerên me dîl hatin girtin. Di nav wan de sivîl û jinên welatparêz jî hebûn. Di encama têkoşînê de, hin girtî hatin berdan. Lê girtîgehên HTŞê cihadist tijî girtîyên ku li benda azadiyê ne ne. Gelek malbat hîn jî nizanin çi bi serê zarokên wan hatiye.

Ma tenê em in ku ev zilm dîtine? Ma ev hemû revandin û windabûn tenê bi serê me de tên? Mixabin, na! Li gelek deverên cîhanê, şoreşger rastî revandin, kuştin û dîlgirtinê hatine. Gelek dewletên faşîst hîn jî bi vî rengî bi şoreşgeran re tevdigerin. Bi taybetî dewleta faşîst a metingehkar a Tirkiyeyê van îşkenceyan pêk tîne.Dewleta Îranê rojanê êrîşê li ser şoreşgeran,Kurdên welatparezên diki. Şoreşgeran li çaraliyê cîhanê têkoşînên mezin dan. Jinan di van têkoşînan de rolên pir girîng lîstin.Ew jin bi têkoşînê bûn şoreşger. Berxwedana wan gelek jinan îlham kir. Her çend mesafeyên mezin di navbera me de hebin jî, têkoşînên bindestan li çaraliyê cîhanê dişibin hev. Tevgerên şoreşgerî li çaraliyê cîhanê xwedî mîrateyek pir bi hêz in.Di vê dosyayê de,em ê berxwedaniyen li dijî êrîşên windakirina cih bidin. Bi lêkolîna mînakên ji çar aliyên cîhanê, em ê nîqaş bikin ka meriv çawa dikare têkoşîna girtiyan li Rojava berfireh bike.

Dayikên Arjantînî: Dayikên Plaza del Mayo

Arjantîn xwedî têkoşîneke şoreşgerî ya pir kûr e. Dayikên Plaza del Mayo di pêşengiya vê de ne. Di navbera salên 1976 û 1983an de, Arjantîn di bin dîktatoriyeke leşkerî ya faşîst de bû. Di van salan de, gelek şoreşger dîl hatin girtin. Dewleta faşîst şoreşger îşkence kirin û kuştin. Malbatên wan nizanibûn ew li ku ne. Ew kesên ku ji bo pirsîna çarenûsa zarokên xwe çûn qereqola polîsan jî rastî îşkenceyê hatin. Dewleta faşîst laşên şoreşgerên ku ew dikuştin diavêt okyanûsê an jî hestiyên wan dida ajalan. Malbatan heta nizanibûn gorên zarokên wan li ku ne. Dîktatoriya faşîst qet qebûl nekir ku şoreşgeran dîl girtiye, ji wan re gotiye, "Herin hevalên zarokên xwe bipirsin" an jî "Ji şoreşgeran bipirsin, zarokên we bi wan re ne." Îro, hikûmeta cîhadîst a HTŞ'ê heman tiştan li ser girtiyên me dibêje. Dibêjin, "Me girtiyan berdan, kesekî din nemaye," û hwd. Lê em dizanin ku zarokên me di destê wan de ne.

Li Arjantînê, komek jin li dijî vê zilmê li hev civiyan. Di 30ê Nîsana 1977an de, 14 jinan ji bo ku çarenûsa zarokên xwe bizanin çalakîyek li dar xistin. Cihê ku wan çalakî derxistin Plaza del Mayo bû, ku bi zimanê me' Meydana Gulanê' ye. Vê çalakî gelek bala xelkê kişand. Wê demê her kes ji dîktatoriya leşkerî ditirsiya. Lê dayikên şoreşgeran her tiştî xistin xeterê û li dijî leşkerên faşîst derketin kolanan. Wan dayikan berxwedanek mezin dest pê kir.Leşkerên faşîst bi hovane êrîşî dayikan kirin. Wan ji porê wan girtin û ew li erdê kaş kirin. Bi saetan li kolanan li dayikan dan. Lê dayikan dev ji têkoşînê bernedan. Her carê ew bi hejmareke hîn mezintir derdiketin. Û di dawiyê de, bi mîlyonan mirov hebûn.

Dayikên Arjantînî kefîye spî li ser porê xwe dikirin; ev kefiye dema piçûkanî xwe da pêçên zarokên wan bûn. Kefiye spî bûn sembola dayikan. Dayikên Arjantînî li gelek deverên cîhanê îlhama şoreşgeran dan. Dewleta faşîst wan wekî "Dînên Plaza del Mayo" bi nav dikir, hewl dida ku wan di çavên civakê de biçûk bixe. Lê van dayikan, bi berxwedana xwe, tevahiya cîhanê hejand.

Dirûşma dayikên Arjantînî "Careke din qet nebe" bû. Ev tê çi wateyê? Ev tê wê wateyê ku hûn ê careke din nikaribin zarokên me dîl bigirin. Em ê ji we netirsin
.

Dayikên Şemiyê

Dayikên Plaza del Mayo li Arjantînê ji bo dayikên ku li dijî dewleta faşîst a mêtinger a Tirk têkoşin dikin, bûn mînak. Dayikên Şemiyê bûn hevwateya hesabpirsîna ji dewleta faşîst a mêtinger a Tirk.

Dayikên Şemiyê ji 27ê Gulana 1995an vir ve her Şemiyê çalakiyê li dar dixin. Ev dayik li Meydana Şemiyê ya Stenbolê dicivin û ji bo zarokên xwe yên winda û revandin hesabpirsînê dixwazin. Ev çalakîyê ji Dayikên Plaza del Mayo mînak girtin.

Di 12ê Adara 1995an de, li Taxa Gazî serhildanek çêbû. Ev serhildan ji aliyê Komunîstên Marksîst-Lenînîst ve hate birêvebirin. Fermandarê serhildanê Hasan Ocak endamê MLKP (Partiya Komunîst a Marksîst-Lenînîst) bû. Serhildanê gelek bal kişand ser xwe û hêvî da hemû bindestan. Dewleta Tirk dixwest tola serhildanê hilîne. Di 21ê Adara 1995an de, Hasan Ocak ji aliyê îstîxbarata Tirk ve hate revandin. Dewleta Tirk Hasan Ocak îşkence kir û şehid xist.

Dayika wî, Emîne Ocak, çû Qada Galatasarayê ya li Stenbolê da ku lê bigere. Çalakiyê, ku ji aliyê Emîne Ana ve hatibû destpêkirin, di nav 55 rojan de mezin bû. Li seranserê welêt pirsên li ser çarenûsa şoreşgeran hatin pirsîn. Dewleta Tirk neçar ma ku kuştina Hasan Ocak qebûl bike. Demek dirêj ji bo zanîna cihê gora Hasan Ocak çalakîyê hatin lidarxistin. Di dawiyê de, berxwedan bi ser ket û dewleta Tirk cihê gorê eşkere kir. Fermandarê sor Komunîst Hasan Ocak bi merasîmek ku bi mîlyonan kes beşdar bûn, hate veşartin. Ev berxwedan piştî dîtina hestiyên Hasan Ocak jî berdewam kir. Bi salan malbatên windayan, bi pêşengiya dayikan, li şoreşger û welatparêzên ku ji aliyê dewleta dagirker a Tirk ve hatine revandin û kuştin geriyan. Ev têkoşîn îro jî berdewam dike. Dewleta Tirk porê dayikan diqetand, wan dikişand erdê, lê dayikan dev jê bernedan.

Ev her du mînak gelek tiştan ji me re ve dibêjin. Ev têkoşîn pir dijwar û bi êş bû. Her hêstirek ku dayikan dirijandin ji dijmin tolhildanê dixwest. Wan dayikan ji dewletê hesab xwestin. Wan ji dewleta Tirk a metingehkar ku hebûna Kurdan înkar dikir hesab xwestin. Ew li hember rêxistin, partiye şoreşer an tevgera şoreşgeran ra hêrs nebûn û aciz nebûn. Ew neketin nav xerabiya dijmin. Dema ku ew derketin kolanan, wan li leşkerên faşistên ku çek hildigirtin qîr kirin: "We zarokên me sax girtin, hûn ê wan sax vegerînin!" .Heta îro jî, gelek ji wan dayikan nekarîne gorên zarokên xwe bibînin. Gelek dayikên Kurd, mîna Dayika Berfo, 33 sal,heta nefesa xwe ya dawî li ser çarenûsa zarokên xwe dipirsin. Dayika Berfo bi salan deriyê mala xwe neguherand da ku kurê wê dema ku vegeriya wê nas bike. Ew bêyî ku gora kurê xwe bibîne temena xwe 105 salî bû jîyana xwe dest daye.

Wan piştgirî da hev. Divê em hem ji Dayikên Plaza del Mayo û hem jî ji Dayikên Şemiyê dersan bistînin. Divê em di lêgerîna dîlên xwe de bi heman berxwedan û wêrekiyê bimeşin. Hêsirên dayikên dîlgirtî bikin guleyên çekên me.

Berxwedana Jinan a Ku Dîwaran Kela Zindanan Hilweşandin

Seda Baykan, Eva Maria Michelmann û Nergiz Muhammedi...Ev her sê jinên ku ji herêmên cuda yên cîhanê tên, nûnertiya wê rastiya ku dewletên serdestiyamêr herî zêde jê ditirsin dikin: Îradeya jina birêxistinkirî, zana û berxwedêr.

Lê belê gelo ev her sê jin û bêhejmar jinên şoreşger çima di zindanan de ne? Çand û pergala dewletê ya îro çi dibe bila bibe –çi cîhadîst, çi mela û çi faşîst– di bingeha hemûyan de serdestiyamêra paşverû heye. Ji ber ku dewletên serdestiyamêr, veguherîna jinan a kirde ku çarenûsa xwe bi xwe diyar dike, wekî gefekê dibînin. Ji ber vê yekê, ew difikirin ku bi polîtîkayên tecrîdê, dîlgirtinê, zext, îşkence û heta bi gefên sêdaredanê dikarin têkoşîna jinan lawaz bikin û wan bitirsînin.

Berxwedana ku Seda Baykan dimeşîne, li dijî tecrîda ku ji bo şikandina îradeya jinan tê meşandin serhildanek e. Heval Seda tevî şert û mercên giran ên tecrîdê ku demeke dirêj e berdewam dike, gavekê jî bi paş ve neavêtiye; wê laşê xwe veguhartibû amûreke têkoşînê û bi greva birçîbûnê hewl dide dengê xwe bigihîne her derê. Bi sedan jinên ku vê berxwedanê dibînin, ji Bakur heta Ewropayê li bi dehan bajaran biryar dan ku bibin dengê heval Seda û berxwedana wê mezin dikin. Seda Baykan ev 4 sal in di bin şert û mercên giran ên tecrîdê de ye. Dewleta Tirk destûrê nade ku ew bi tu kesî re hevdîtinê bike. Di nav girtiyên edlî de di hucreyekê de tê girtin. Saetên wê yên hewayê jî pir kêm in. Ew her gav bi mirinê tê gefxwarin. Girtina Seda Baykan a di nav girtiyên edlî de pêkanîneke bihişyarî û zanebûn e. Hewl didin Seda ji cîhanê qut bikin. Tu agahiyê nagire, nikare bi malbata xwe re biaxive û kesekî din nabe ne. Ev, polîtîkaya dewleta Tirk a faşîst e ku li ser komunîst û şoreşgeran dimeşîne. Dixwaze wan bêzar bike û teslîm bigire.

Eva Maria Michelmann jî wekî rojnamevaneke ku di nav şer û pevçûnan de li pey rastiyê çû, hate hedefgirtin. Eva Maria Michelmann ji sala 2022'yan û vir ve di şoreşa Rojava de rojnamevanî dikir. Dema ku çeteyên HTŞ'ê yên Îslama Siyasî êrîşî Rojava kirin, Eva Maria ji bo ku rastiyê bigihîne cîhanê li ser karê xwe bû. Di 18'ê Çileyê 2026'an de li Reqayê tevî hevalê xwe yê rojnamevan Ahmed Polad êrîşên hucreyên DAIŞ'ê tomar kirin. Wan ev wehşet îspat kir û rastî ji tevahiya cîhanê re ragihandin. Eva Maria Michelmann û Ahmed Polad ji aliyê çeteyên cîhadîst ve hatin dîlgirtin. Bi mehan cihê wan nehat zanîn. Malbat, parêzer û hevalên Eva Maria û Ahmed Polad bi mehan e ji bo wan têdikoşin. Girtiyên ku ji destê çeteyên cîhadîst rizgar bûn, belge û delîlên nû yên der barê wan de anîn. Di encama vê têkoşînê de, HTŞ'ya cîhadîst û Îslamîst a siyasî neçar ma li mikur bê ku Eva Maria dîl girtiye. Lê belê tiştên ku heval Eva jiyaye, careke din nîşan da ku rojnamevanî ne tenê pîşeyek e, di heman demê de berpirsiyariya bûn dengê gelan e. Di encama têkoşîn û pişgiriya hatî dayîn de Di encama têkoşîn û israrê de, Eva Maria di 19ê Hezîranê de gihîşt Almanya. Bi mehan di destê çeteyên tecawizkar û çeteyên îslamîyên polîtîk û cîhadîst de dîl ma. Ev serkeftin nîşanî me dide ku têkoşînê encam daye.

Nergiz Muhammedi jî ji ber ku bi salan e li Îranê dengê jinan, kedkaran û bindestan e, bi zextan re rû bi rû dimîne. Weke gelek jinên şoreşger ên li Îranê, wê jî zext û îşkence dîtin. Tevî nexweşiyên xwe û krîza dil a ku derbas kiriye, û tevî gefên domdar ên darvekirinê jî dev ji têkoşîna xwe bernedaye. Tevî ku xwediyê Xelata Aştiyê ya Nobelê ye jî girtina wê ya di zindanan de nîşan dide ku dewletên serdestiyamêr çiqas ji têkoşîna azadiyê ya jinan ditirsin.

Tecrîda li ser Seda Baykan, dîlgirtina Eva Maria Michelmann û gefên sêdaredanê yên bi salan e li ser Nergiz Muhammedi ya nexweş têne meşandin, rûyên cuda yên heman pergalê û dewletên cuda ne, lê zihniyeta wan yek e. Armanc ne tenê bêdengkirina sê jinan e. Armanc, di kesayetiya wan de lawazkirina têkoşîna azadiya jinê ya ku mezin dibe ye û belavkirina tirsê di nav bi milyonan jinên ku têdikoşin de ye.

jinên çar aliyên cîhanê dibe hêvî. Ji ber ku têkoşîna azadiya jinê ne meseleya kesekê, rêxistinekê yan jî welatekî ye; têkoşîna hevpar a hemû jinan e.

Ji ber vê yekê, îro peywira me ne tenê qeydkirina tiştên ku ew dijîn e; erka me xwedîderketin û mezinkirina wê têkoşînê ye ku ew di zindanên dijmin de dimeşînin. Jin çi di zindanê de bin çi li derve, çi şoreşger bin çi nebin, her dem di bin gef û xetereyê de dijîn.

Ev rewş ne tenê ji bo Îran, Tirkiye yan jî cîhên din ên cîhanê ye; di heman demê de li erdnîgariya ku em lê dijîn hîn kûrtir e. Li Rojava jinan bi salan e bi dayîna berdêlên mezin, rêxistinbûn, sazî û amûrên xwe yên têkoşînê afirandine. Lê belê îro zihniyeta HTŞ'ê ya ku îradeya jinê tune dihesibîne, dixwaze wan di nava malê de asê bike, pirzewaciyê bi qanûnan hîn bêtir xurt bike, zewaca di temenê piçûk de asayî bike û têkoşîna birêxistinkirî ya jinan hedef digire, hebûna xwe diparêze. Ev nêzîkatiya ku ji gotina jinê ya azad, ji biryargirtina wan û avakirina jiyana wan bi xwe ditirse, di bin kîjan navî de derkeve holê bila bibe, di cewherê xwe de berhema heman zihniyeta serdestiyamêr

Lê dîrok careke din nîşan dide ku jinên ku dirûşmeya "Berxwedan Jîyan e, Jin Jîyan Azadî" li rûyê jiyana xwe hûnandine, li beramberî zextan teslîm nabin. Berevajî vê, ew zindanên dewletên faşîst veduguhêrin çeperên nû yên berxwedanê. Ev jinên ku di hucreyên dijmin de tên girtin, li şûna ku îradeya xwe teslîm bikin, têkoşîna xwe hîn bêtir mezin dikin. Dengê wan ji dîwaran derbas dibe, berxwedana wan sînoran diçirîne û cesaretê dide jinên li derve. Îro greva birçîbûnê ya ku heval Seda Baykan ji 1'ê Nîsanê vir ve dimeşîne, tîpên rastiyê û israra ronîkirina heqîqetê ya heval Eva û berxwedana heval Nergiz a li dijî gefên darvekirinê yên di zindanê de (tevî ku parêzvana aştiyê ya xwedî xelata Nobelê ye û bi nexweşiyên giran re têdikoşe), ne tenê ji bo jinên welatên wan, lê ji bo e.

Ji ber vê yekê, îro erka ku dikeve ser milê jinan ne bêdengbûn e, hîn bêtir rêxistinbûn e. Li her taxê, li her gundî, li her cihê kar û li her dibistanê mezinakirina pişgiriya jinê ye. Ji ber vê yekê, wekî JKŞ banga me pir eşkere û hêsan e: "Destkeftiyên jinan hêza me ne, em biparêzin". Li şûna ku em yek bi yek têbikoşin, em xwe birêxistin bikin da ku îradeya me xurt bibe, da ku ne em jinên ku ditirsin bin, sedema tirsê ew dewletên serdestiyamêr bin ku gefê li me dixwin.

Têkoşîna ku ji bo azadiya jinê tê dayîn ne di nav dîwarên hucreyan de bi cih dibe, ne jî bi zextan bi dawî dibe. Jin her ku li ber xwe bidin, azadî dê mezin bibe; azadî her ku mezin bibe, jin dê bibin pêşengên sosyalizmê.

JKŞ'ê pêngava xwe ya nû ya bi navê "Em ê biparêzin" li Qamisloyê bi daxuyaniyek çapemeniyê ragihand. 'Di vê heyama krîtîk a şoreşa jinan a Rojava de, li dijî dijmina jinan, çeteyên cîhadîst û dagirkeran , em dest bi tevgera 'Em ê biparêzin' ya du qonaxan dikin.

Têkoşîna me ya li dijî tasfiyekirina şoreşa jinan a HTS ya cîhadîst a dijmina jinan bi navê 'entegrasyon' wê bidome. Em ê li ser bingeha hêza xwe ya xweser têkoşîna ji bo xurtkirina yekîneyên parastina jinan û hêzên xweparastinê bi taybetî YPJ'ê bidomînin. Li ser navê makezagona nû em ê li hember bêcezakirina qatilên jinan, tecawizkar, yên ku bi dijmin re hevkariyê dikin û kedxwariyan bêdeng nemînin. Em destkeftiyên jinan ên ku bi xwîn û jiyan û xwêdanê bi dest xistine nadin mêtingerên xwe. Dema em diçin salvegera şoreşa jinan, em ê her roj bêyî ku dev jê berdin dubare bikin, ji ber ku 'destkeftiyên jinan hêza me ye, em ê biparêzin'

Komunîstên Rojavayî li Qamişlo şervana jin a komunîst Raperîn Dîcle li ser gora wê ya bi bîr anîn.

Endamên JKŞê şehîdên xwe ji bîr nekirin. Di Cejna Qurbanê da goristana şehîdan hatin ziyaret kirin.Ş.Yılmaz û Ş.Zîlan Destan di salvegera şahadeta wan da hatin bîranin. Endamên JKŞ'ê li bajarê Hesekê û Kobanê ji bo Ş. Zîlan Destan bîranînek li dar xistin. Bîranîn rihê şoreşgerî û dilsoziya Zîlan Destan giredanbûyina bi têkoşîna sosyalîzmê re nîşan da

Jinên Komunîst ên Şoreşger serdana YPJ'ê kirin. Di çarçoveya hamleya "Destkeftiyên jinan hêza me ne, em ê biparêzin" de ku ji hêla JKŞ'ê ve hatiye destpêkirin, şandeyeke JKŞ'ê serdana bîryargeha YPJ'ê kir û piştgiriya xwe ji bo kampanyaya "Em hemû YPJ ne" diyar kir

Endamên JKŞê ya Cizirê civineke yekitiya jınan li darxistin. Jinên ji netewe û baweriyên cuda bi şiara 'Yekîtîya jinan destkeftiyek şoreşê ye, Em ê Biparêzin' hatin cem hev.

JKŞ li Qamişloyê li ber avahiya Neteweyên Yekbûyî daxuyaniyeke çapemeniyê da. Wan li ser aqibeta her du rojnamevanên ku di 18ê Çile de li Reqayê hatibûn revandin pirs kir.

JKŞ li dijî êrişên metîngehkarî ên li ser zimanê Kurdî daket qadan. Di roja Cejna Zimanê Kurdî da beşdarî daxuyanî û çalakî bûn



Pêvajoya Entegrasyonê û Hemleya JKŞê

Em li ser hamleya dawî ya JKŞ'ê ya bi dirûşmeya "Destkeftiyên jinan hêza me ye, em ê biparêzin" ligel Berdevka JKŞê Mizgîn Erebo axivîn. Tu bi xêr hatî Mizgîn. Em di destpêkê de salvegera 15'an a Şoreşa Rojava li te pîroz dikin.

Piştî êrîşên 6ê Çileyê, di Şoreşa Rojava de pêvajoyeke nû ya guhertinê dest pê kir. Ev guhertin çawa bandorê li jinan dikin û hûn vê pêvajoya entegrasyonê ji perspektîfa jinan ve çawa dinirxînin?

Mizgîn Erebo: Belê, ew êrîşên ku pêk hatin bi armanca tunekirina Şoreşa Rojava bi temamî bûn, lê bi saya şehîdên leheng, bîrdaran, esîran û gelek şervanên azadiyê ew tişt bi ser neket.

Erê, gelek aliyên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê hatin windakirin û ketin destê paşverûyên, lê me axa Rojava berneda. Li vir gelek tiştan rola xwe lîst; yek ji wan jî serkeftin û destkeftiyên jinan ên di nava Şoreşa Rojava da bû. Wekî em dizanin, hişmendiya baviksalarî û eşîrtî berî Şoreşa Rojava di hemû aliyan da dest danîbû ser mafên jinan ên mirovî. Dema ku jin bûn xwedî maf û di jiyanê da cihê xwe bi mafên wekhev girtin, ev wekî êrîşekê li hemberî pergala eşîrtî hat dîtin. Zewacên di temenê biçûk de, pirzewacî, mafê mîrasê û mafê giliyê; ev gişt destkeftiyên vê şoreşê ne û bi têkoşînên birdozî hatine bi dest xistin. Lê me berê jî dinirxand; hebûna van mafan wekî zagonî mîsoger e, lê di rastiya jiyanê de hîn gelek kêmasî û nepejirandin rû didin. Îro hîn metirsiyeke mezintir heye.

Mînakên vê ne dûr in; hema em tenê bala xwe bidin pêvajoya şer û êrîşên li ser jinan. Di berdana esîran de, hevalên me yên jin di kafîleya dawî de hatin berdan. Çawa HTŞ'ê dest bi guhertina zagonan kir, di destpêkê de pirzewacî erê kir; ne bes e, bi alîkariya pereyan jî ev tişt teşwîq kir.

Di pêvajoya entegrasyonê da jixwe hebûna jinan a birêxistinkirî qebûl nakin; ne di qada civakî da, ne jî di qada çekdarî da. Yanî rasterast hêza jinên birêxistinkirî ji bo xwe û hebûna xwe mîna êrîşekê dibînin; lewma hebûna YPJ'ê

nayê qebûlkirin. Ji ber ku di hişmendiya wan de, ya ku dixwazin ji aliyê civakî ve bidin pejirandin ew e ku jin dîsa vegerin jiyana xwe ya koletiyê. Lewma em dikarin bibêjin ku pêvajoya entegrasyonê ji bo jinan careke din bû qada cengê da ku jin hebûna xwe îspat bikin û nîşan bidin ku ew ê her tim hebin.

Şoreşa Rojava dikeve sala xwe ya 15'an û komunîst di vê xeta welatparêzîyên sosyalît da 15 sal in şer dikin. Beşdariya jinên komunîst di vê pêvajoyê de pir mezin e. Hûn sala 15an a şoreşê ji vê perspektîfê ve çawa dinirxînin?

Mizgîn Erebo: Di diyalektîka jiyanê de, yanî di xwezaya jiyanê de her tim guhertin heye. Tu têkoşînê dikî, fêr dibî, ji fêrbûnê guhertinan ava dikî, tu digihîjî qonaxekê û dîsa rewşa xwe dinirxînî û têkoşîneke nû dest pê dikî. Hebûna me ya di Şoreşa Rojava de jî bi vî rengî ye. Jinên pêşeng ên komunîst rewşa Rojava dîtin û bi hemû hebûna xwe ji bo avakirina Şoreşa Rojava şer kirin. Ji ber ku me dizanibû ku sedsala 21emîn wê bibe sedsala şoreşa jinan. Li Kobanê Sarya Özgür, li Til Temirê Avaşîn Têkoşîn Güneş, li Minbicê Raperîn Dicle, li Reqqayê Destan Temmuz, li Qamişloyê Zîlan Destan, li Hesekê jî Îsyan Tolhildan a Pirsûsê... Ew pêşengên me ne ku canê xwe feda kirin ji bo hebûn û parastina vê şoreşê. Hîn bi sedan û bi hezaran şehîdên me hene. Ji ber ku me dizanibû heger em wekî jin dixwazin bibin xwedî maf di vê şoreşê de, divê di destpêkê de em di pêkanîna vê şoreşê de hebin da ku em bikaribin bingeha têkoşîna xwe ya siberojê ava bikin.

Bi rastî jinên Rojavayi xwedî nêrînên mezin, nîqaşên xurt û wêrek in. Ji ber wê yekê, me di nav van 15 salan de her tim li gorî rewşên heyî bi dirûşmeyên curbecur kar û xebatên berfireh dimeşandin. Îro bi taybetî em wekî jin di pêvajoyeke zehmet lê pir girîng re derbas dibin. Erê me ax winda kir, erê mafên me di entegrasyonê de nayên qebûlkirin, lê ew rastî bi giştî ji bo me ne cihê rawestandin an jî sekinandinê ne. Ew ji bo me astengiyek e ku gerek em têkoşîna xwe bi zanist, bi wêrekî û bi rêxistinî bilindtir bikin, vê wekî ezmûnekê qebûl bikin û serbikevin. Em gihîştin qonaxeke wisa ku gerek em dev ji tu serkeftinên ku me pêk anîne bernedin û wan biparêzin.

Wê kampanyayek ji bo parastina mafên jinan da destpêkirin. Hûn dikarin ji me re qala vê kampanyayê bikin?

Mizgîn Erebo: Em wekî JKŞ'ê parastina şoreşa jinê wekî xeta sor dibînin. Hebûna şoreşa me, bi hebûna destkeftiyên jinan re ye. Ji ber vê yekê me hamleya xwe ya "Em ê biparêzin" dest pê kir. Heta 1'ê Gulanê şiara me "Keda me hêza me ye, em ê biparêzin" bû. Qonaxa duyemîn jî bi şiara "Destkeftiyên jinan hêza me ye, em ê biparêzin" berdewam dike. Ji ber ku min berê jî anî ser zimand; heyama ku em tê de derbas dibin pêwîst dike ku em bi hemû hêza xwe li dijî cîhadîst, tecavuzkar û dijminên jinan bimeşin. Gerek em şoreşa xwe, YPJ'a xwe, hevserokatiya xwe, zimanê xwe û gelek destkeftiyên xwe ji çeteyên HTŞ'ê re nehêlin. Di çarçoveya hamleya xwe de em gelek civîn û perwerdeyan çêdikin, tevlî çalakiyên din dibin û pêşengên şoreşê bi bîr tînin. Yekitiya jinan ji bo parastina destkeftiyên jinan pir girîng e.

Bangawaziya we ji bo jinên Rojava çi ye?

Mizgîn Erebo: Ew şoreş bi saya me çêbû. Bi keda me, xwîna me û xwêdana me ava bû. Her pêvajoya tasfiyekirinê bi saya jinan hat sekinandin, her rewşa giran bi pêşengtiya jinan hat derbaskirin. Em hêza xwe bibînin û birêxistin bibin.

Ez careke din bi vê maseleyê, bi boneya salvegera 15'an a Şoreşa Rojava şehîdên xwe bi bîr tînim û salvegera 15'an li hemû jinên Rojava pîroz dikim.

Di 18ê Çileya 2026an de, li Reqayê, çeteyên HTS yên cîhadîst Eva Maria Michelmann û Ahmed Polad dîlgirtin. Piştî çend mehan têkoşînê me, Eva Maria Michelmann azadiya xwe bi dest xist. Eva û Ahmed, ku êrîşên çeteyên HTS yên cîhadîst li dijî şoreşa jinan anîn ber çavên cîhanê û tevgerên şaneyên DAIŞ yên razayî belge kirin, bûn dengê azadiyê. Têkoşîn û hevgirtina ku bi mehan kolan bi kolan hate meşandin encam da. Eva Maria di 19ê Hezîranê de gihîşt Elmanyayê. Wek xwişkên wê yên ji Rojava, em hezkirin û silavan ji Eva Maria re dişînin. Bi xêr hatî azadiyê, Eva Maria, dengê azad ê şoreşa jinan a Rojava. Niha dem hatiye ku têkoşîna ji bo Ahmed Polad berfirehtir bibe û jin di têkoşîna girtiyên siyasî da pêşengiyê bikin.

Ala Rojava Hilde Şoreşa Jin Biparêze!

Çima divê jinên ciwan li Rojavayê tevlî têkoşîna çekdarî bibin?

Îro li erdnîgariya bixwîn a Rojhilata Navîn de, xala hevpar a hemû hêzên paşverû yên ku di xuyabûnê de wekî dijminê hev xuya dikin, dijminahiya li dijî jinê ye. Ev tifaqa tarî ya ku ji HTŞ'ê heta wekîlên AKP'ê yên li herêmê, ji bermayiyên DAÎŞ'ê heta mollayên Îranê dirêj e, azadiya jinê wekî gefa herî mezin a li ser desthilatdariya xwe dibîne. Ji bo wan jin ne parçeyekî jiyanê, lê parçeyekî milk e; ne xwedî gotin, lê divê guhdar be. Her mafê jinê yê ku li Rojavayê tê qezenckirin, di çavê vê hişmendiya paşverû de wekî têkçûnekê ye. Ji ber vê yekê, yên ku îro hewl didin YPJ'ê tesfiye bikin, sibe dê ji bo ji holê rakirina hemû destkeftiyên jinan bikevin tevgerê. Li hemberî vê pergala ku niyetê wê nîne tu mafî bide jinê, tenê vebijarkek heye: berxwedan.

Heke Jin Bê Xweparastin Bimîne, Qada Wê Ya Azad Jî Namîne

Di dirêjahiya dîrokê de, dema ku mafê xweparastinê ji destê jinan hat girtin, wan berdêlên herî giran dan. Me li Gazze, Afganistan, Somalî, Ukrayna û Îranê dît ku jin di şeran de çawa bûn hedef û çawa bêçare hatin hiştin. Ji ber ku di xwezayê de tu zindî bê xweparastin nîne, lê pergala mêrserdest jin ji vê mafê bingehîn bêpar hiştiye. Jinan li Rojavayê ev yek pir baş fêm kir. Wan bi girtina çekan re ne tenê li dijî çeteyên DAÎŞ'ê, di heman demê de li dijî hişmendiya mêr a paşverû ya di nav xwe de jî şer kirin. Û vê şerî ev tişt nîşanî wan da: Heke jin xweparastina xwe ava neke, nikare qada xwe ya azad jî ava bike. Gotina jineke bêçek, di cîhana mêrserdest de tenê bi qasî ku destûr jê re tê dayîn tê bihîstin. Şoreşa Rojavayê şoreşeke wisa ye ku jin tê de bi çek û rêxistinbûna xwe heye. Îro ji bo parastina vê şoreşê, erkê me ye ku em YPJ û hemû hêzên parastina jinê a biçêkdari mezin bikin.

Îro Hedefa Serekî: Durxistina Jinê Ji Qadên Şer E

Tiştê ku hikûmeta demkî ya Şamê û hêzên paşverû yên li pişt wê dixwazin bikin pir eşkere ye: vekişandina jinan ji qadên şer, vegerandina wan a li ser cihê wan ê berê, anku li

malê û temsîliyetên sembolîk. Ew naxwazin mafê gotinê bidin jinê; heke hebe jî, ew dixwazin ev yek tenê sembolîk û di bin kontrolê de be. Di pêvajoya şoreşa ku bi salan e li Rojavayê berdewam dike de, jin ji pergala hevserokatiyê heta aboriyê, ji parastinê heta perwerdeyê di her qadê de bûn kirde. Niha ev destkeftî di bin metirsiyê de ne. Di

makezagona nû ya Sûriyeyê de tunehesibandina jinan, di parlemanê de tenê cihdayîna 6 jinan û di kabineyê de nebûna tu jinekê, nîşaneya vê hişmendiya paşverû ye. Gotubêjkirina statuya YPJ'ê bi xwe bi tena serê xwe êrîşek e. Li dijî vê êrîşa ku hewl dide xweparastina jinê ji holê rake, tenê bersivek heye: Bi gotina "Em hemû YPJ ne" em

ê destkeftiyên xwe biparêzin; li qadan, li eniyan û li kuçeyan hebûna xwe nîşan bidin.

Jinên Ciwan: Xwediyên Pêşeroja Kurdistana Azad in

Kirdeyên sereke yên vê têkoşînê jinên ciwan in. Ew ji rojên destpêkê yên şoreşa Rojavayê ve li eniyên herî pêş cih girtin. Hejmara jinên ciwan ên ku şehîd ketine gihîşt hezaran. Lê her şehîdek, bû sedema tevlîbûna hezaran ciwanên nû ya li nav berxwedanê. Îro jinên ciwan pir baş dizanin ku girtina çekê tê çi wateyê. Çek ji bo wan ne tenê amûreke parastinê ye, di heman demê de mîfteya hebûnê, ya xwedîgotinbûnê û ya avakirina pêşerojê ye. Jineke ku di pêşeroja Kurdistana azad de nebe xwedî gotin, nikare di mala xwe, kuçeya xwe û taxa xwe de jî bibe xwedî gotin. Jineke ku nikaribe qedera welatê xwe diyar bike, nikare qedera xwe jî diyar bike. Ji ber vê yekê divê jinên ciwan şer bikin. Şer, ne hilbijartina mirinê ye, watedarkirina jiyanê ye. Şer, şikandina zincîran e, sernetewandina li ber hişmendiya paşverû ye û pêkanîna jiyaneke azad e.

